

# MEM Ü ZİN

EHMEDÊ XANÎ





g





EHMEDÊ XANÎ

Türkçesi : M. E. Bozarslan

**GÜN YAYINLARI**

Başmusahip Sokak, Tan Ap. No. 6  
İSTANBUL - 1968

HİLAL MATBAACILIK KOLL. ŞTİ. - İstanbul - 1968 - Tel.: 22 91 78

**PESİSGOTİN**

**ÖNSÖZ**

MEM Ü ZİN dı nava pirtûkên bêjeyîyê dinyayê ên nemirda li qora pêşin cih girtîye. Ev pirtûka gewre bî babetê xwe hevtayê ROMEO Ü JÜLİYET'a Şekspîr û LEYLA Ü MECNÜN'a Fizûlî'ye.

Hem bî babetê xwe, hem jî bî fesahet û rûmeta xwe-ya bêjeyî ev pirtûk dilê her xwendevanî bî alî xweda dî kêşe û hêjayîya xwe bî her kesî dî de qebûlkîrin.

Xasma li Rohelatê welatê me dî nava gelên xelkêda ev pirtûk pir û pir hatîye naskîrin. Bî wî qasî ku gelek miro-vênen nexwendî jî li gorî xwe hnek perçen wê jiber dî kin û carna ku mînasebet tê, jî dev dî xwînnî.

Lê mixabin ku xwendevanênen welatê me, ên ku bî zarê Kurdi û Tirkî dî peyîvin tev, jî xwendîna vê pirtûka hêja heta nuha bê par mane. Lewra pirtûk bî herfên Erebî hatîye nîvîsîn û bî zarê Tirkî ne hatîye wergerandin. Jî ber vî, tenê kesên ku bî zarê Kurdi û herfên Erebî tev dî zanîn, dî karin wê bî xwînnîn. Eşkeraye ku hejmara vana jî pir û pir hendike.

Jibo vê îftîyaca han me MEM Ü ZİN'ê hem wer gerand bî herfên Latnî hem jî wer gerand bî zarê Tirkî. Bî vî awayî fersenda xwendîna wê, jî xwendevanênen ku bî zarê Kurdi û Tirkî dî peyîvin tevra çê dî be.

Jibo ku mîqayesekirîna eslê wê û wergerînika wêya bî zarê Tirkî jî xwendevananra hêsan be, me rûpelên Kurdi û Tirkî li hember hevdû, rûpelên Kurdi li alî çepê, ên Tirkî jî li alî rastê danî. Dî her rûpelekîda bî qasê hevdû ferd hatîn rêzkîrin.



Jî ber ku ev pirtûk dî dawîya sedsala XVII'anda hatîye nîvîsîn, wek pirtûkên hevdemêd wê gîst, dî wêda jî gelek pirsên Erebî û Farisi hene. Tabii dî wergerînika Tirkî da me van pîrsan jî wek ên Kurdi wer gerand. Lê dî eslê

MEM Ü ZİN dünyanın ölmez edebî eserleri arasında ön safta yer almıştır. Bu dev eser konusuyla Şekspir'in ROMEO VE JULİYET'inin, Fuzulî'nın LEYLA İLE MEC-NUN'unun bir dengidir.

Gerek konusu ve gerekse edebî degeriyle bu eser, her okuyucunun gönlünü kendine çekmekte, değerini herkese kabul ettirmektedir.

Özellikle ülkemizin Doğu bölgesinde bu kitap halk arasında hayli tanınmıştır. O kadar ki birçok okumamış kimseler dahi kendilerine göre kitabın bazı pasajlarını ezerler ve ara sıra münasebet gelince ezbere okumaktadırlar.

Ne yazık ki ülkemizin Kürtçe ve Türkçe konuşan okuyucuları bugüne kadar bu değerli eseri okumaktan yoksun kalmışlardır. Çünkü eser Arap harfleriyle yazılmış, Türkçe'ye de çevrilmemiştir. Bunun için, hem Kürtçe'yi, hem de Arap harfleriyle okumayı bilen kimseler ancak okuyabilemektedirler. Bunların sayısının çok az olduğu aşkırdır.

İşte bu ihtiyacı karşılamak için MEM Ü ZİN'i hem Latin harflerine, hem de Türkçe'ye çevirdik. Böylece Kürtçe de konuşan, Türkçe de konuşan okuyucular için bu kitabı okuma fırsatı doğmaktadır.

\*\*

Orijinaliyle Türkçe çevirisinin karşılaştırılmasını kolaylaşmak için Kürtçe ve Türkçe sayfaları karşılıklı, Kürtçe sayfaları sol, Türkçe sayfaları da sağ tarafa koyduk. Ayrıca her sayfa da aynı miktarda, misra misra dizildi.

Bu eser XVII. yüzyılın sonlarında yazıldığı için, çağdaşı olan diğer bütün eserler gibi onda da birçok Arapça ve Farsça kelime vardır. Tabii Türkçe çevirisinde bu ke-

pirtükêda me van pırsan ne guhart û lî ser halêd wan nivîsi. Jî ber ku her kes bî mana vana nî zane, me dî dawîya pirtükêda ferhengekî ji van pırsanra çê kir û mana wan dî wê ferhengêda bî zarê Kurdi û Türkî tev nivîsi.

\*\*

Çiroka Mem û Zîn'ê bî navê «Memê Alan» dî nava xelkê Kurdda gelek belavbûyîye û gelek kevne. Ev çirok ji berî Mîladêve dî nava xelkêda tê gotin û bûye destanekî mîtolojik.

Hozanê mezîn Ehmedê Xanî ji çiroka «Memê Alan» îlhama xwe girtîye û bî wê îlhamê wê çirokê li gorî jîna dema xwe xistîye kirasekî müşexxes, bî awakî hevdemî û modern nivîsiye. Bî vê yekê hem çirokê ji windabûnê rîzgar kiriye, hem jî ji bêjeyê Kurdi'ra eserekî nemir diyarî kiriye.

Xanî dî vê pirtükêda li dora evîna Mem û Zînê, jîna dema xwe û wezîyeta wêya komeli, zanîyarî û idarî ji bî hunermendyekekî xurt teswîr kiriye û anîye ber çavan. Başiyê, rastiyê, bê, gunehiyê, jarîyê û bindestiyê dî şexsê Memê û Zînê da civandîye û nişandaye. Xîrabiyê, şalûzîyê, fesadî û durûtiyê ji dî şexsê Bekir'da kiriye qalikekî müşexxes û lî ber çavan ra xistîye.

Jî bil vana zîhnîyeta ku wê demê li ser karbîdestên dewletê û çerxa idarî û sîyasî hakimbûye ji bî terzekî hostayî daye fêmkîrin; vê zîhnîyeta paşdamayı, sîtemkar, çewt û kufiki helaniye û lî erdê xistîye; tevger û zîhnîyeta karbîdestan, xasma rabûn û rûniştina wan bî gotinê kesen dilres, kîndar, mefaperest û şalûz anîye rastê, teqbîh kiriye û adeta li dijê vê sazûmana rîzi û sîtemkar ra bûye.

\*\*

**MEM Ú ZİN** berî nuha sê caran hatîye çapkırın:

İmeleri de Kürtçe kelimeler ve cümleler gibi aynen çevirdik. Fakat kitabı orijinalindeki bu yabancı kelimeleri değiştirmedik, olduğu gibi yazdık. Ancak herkes bunların anlamını bilmemektedir. Bunun için kitabı sonuna bir Sözlük ekledik ve bu kelimelerin açıklamasını o sözlükte Kürtçe ve Türkçe olarak yazdık.

\* \*

Mem û Zîn'in hikâyesi «Memê Alan» adıyla Kürt halkı arasında hayli yaygın ve eskidir. Bu hikâye Milâttan önceden bu yana halk arasında söylenen ve mitolojik bir nitelik kazanan bir destandır.

Büyük Ozan Ahmed-i Hânî de «Memê Alan» destanından ilham alarak o hikâyeyi kendi çağının yaşantısına göre somut bir kalıba dökmüş, çağdaş ve modern bir üslûpla yazmıştır. Bu suretle hem destanı kaybolmaktan kurtarmış, hem de Kürt edebiyatına olmez bir eser aramıştır.

Hânî bu eserde Memo ve Zîn'in aşkı etrafında çağının yaşantısını, o zamanın sosyal, kültürel ve idarî durumunu da güclü bir meharetle tasvir etmiş gözler önüne sermiştir. İyiliği, doğruluğu, suçsuzluğu, zayıflığı ve çaresizliği Memo ve Zîn'in sahsinda toplayarak; kötülüğü, dalkavukluğu, fitneciliği ve ikiyüzlülüğü de Bekir'de somutlaştırarak gözler önüne sermiştir.

Bundan başka o çağda yöneticilere, devletin siyasi ve idarî çarkına hâkim olan anlayışı usta bir üslûpla anlatmış; bu geri, zalim, çarpık ve küflü anlayışı yerden yere vurmuş; yöneticilerin davranış ve anlayışını, özellikle onların kötü niyetli, kinci, çıkışıcı ve dalkavuk kimselerin sözüyle oturup kalkmalarını ortaya koyarak kötülemiş, bu çürük ve haksız düzene karşı âdetâ isyan etmiştir.

1 — Sala 1919'wan li Stenbol'ê, bî herfên Erebî.

2 — Sala 1958'an li Şam'ê bî herfên Erebî.

3 — Sala 1962'wan li Moskowa'yê bî herfên Latînî.

Jî bil vî, giştê pirtûkê bî zarê Rusî û çend pişkên wê jî bî zarê Elmanî hatîye wergerandin. Hema hema dî hemî ansiklopediyê dmyayêda qala wê nivîsarê wê tê kîrin. Lî welatê me navê wê û jînenîgarîya nivîsarê wê bî kurtî dî ANSÎKLOPEDÎYA, ÎSLAM, fasîkula 68'an, rûpela 1113'anda derbaz dî be.

\*\*

Amanca me ji wergerandin û belavkirina vê pirtûka hêja eve ku, em vê pirtûka nemira kilasîkî jî xwendevanê welatê xwera bî din karkîrin û bî wan bî din naskîrin. Em bawer dî kîn ku ev wergerandin û belavkirina me, dê hem jî zêdebûna zanîyarîya xwendevananra, hem jî ji dewlemendbûna pirtûkxana welatê mera bî be xîzmetekî. Eger ev bawerîya me bî cîh bê em dê xwe gelek bextewer bî hesibînin.

Jî bil vî, jibo ku wergerandina vê pirtûka nemir bî herfên Latînî û bî zarê Tirkî jî mera bû nesîb, em gelek kîfxwesin.

20/10/1968  
M. Emîn Bozarslan

\*\*

**MEM Ü ZİN** bundan önce üç defa basılmıştır:

- 1 — 1919 yılında İstanbul'da Arap harfleriyle.
- 2 — 1958 yılında Şam'da Arap harfleriyle.
- 3 — 1962 yılında Moskova'da Lâtin harfleriyle.

Bundan başka kitabın tamamı Rusça'ya, bazı bölümleri de Almanca'ya çevrilmiştir. Hemen hemen bütün dünya Ansiklopedilerinde kitaptan ve yazarından bahsedilmektedir. Ülkemizde İSLÂM ANSİKLOPEDİSİ'nin 68. fasikül 1113. sayfasında kitabın adı ve yazarının biyografisi kısaca geçmektedir.

\*\*

Bu kitabı çevirmekte ve yayinallyamaktaki amacımız, bu ölmez klâsik eseri ülkemizin okuyucularına kazandırmak ve tanitmaktır. Bu kitabı çevirip yayinallyamakla, hem okuyucuların kültürünün artmasına, hem de ülkemizin kitaplığının zenginleşmesine hizmet ettiğimize inanıyoruz. Bu inancımız gerçekleşirse kendimizi mutlu sayacağız.

Ayrıca bu ölmez eseri Lâtin harflerine ve Türkçeye çevirmek bize nasibolduğu için çok sevinçliyiz.

20/10/1968  
**M. Emin Bozarslan**

## JİNENİGARIYA XANÎ

Ehmedê Xanî sala 1651'ê li hêla Hekkarî'yê li gündê Xan'ê hatîye dinê. Dî demekî kurtta bî zanîn û zanîyariya xwe nav û deng daye, dî vê rastêda gelek pêşda çûye. Dî 14 salîya xweda ketîye jîna nivîsarîyê.

Xanî ji bêjeyê Kurdfîra xizmetekî pir hêja kırîye û definkirin. Lê mixabin ku tarîxa wefata wî ne kifşe. Meqbera wî li Bayezîda Rohelat ziyaretgaha xelkêye.

Xanî ji bêjeyê Kurdira xizmetekî pir hêja kırîye û gelek şê'r û eserên qedirbilind diyarî kırîye. Şaheserê ese-rêd wî MEM Û ZÎN'e. Hozan vê pirtûkê sala 1695'an temam kırîye. Der heqê destpêkirina wêda tu wesîqe tun-nin. Tê gotin ku sala 1690'i dest bî nivîsına wê kırîye.

NÜBARA BIÇÜKAN ji pirtûkekî wîyê hêjaye. Ev pirtûk Ferhenga Erebî-Kurdîye, ew ji wek MEM Û ZÎN'ê tev menzûme. Dî serê her pişkekî weda ji şiretekî der heqê mefa xwendinê, xebatê, rastiyê û karêن weha yên kome-lîda nivîsiye. Tarîxa nivîsına NÜBARA BIÇÜKAN 1684'e.

Jî bil vana EQÎDA İMANÊ ji bî nezîm nivîsiye. Ev û NÜBARA BIÇÜKAN bî hevdûra çend caran li Sten-bol'ê hatine çapkîrin.

Xanî dî dema xweda gelekî pêşdakarbûye; çawa ku ji MEM Û ZÎN'ê ji tê fêmkîrin li dîjê neheqî-yê, sîtemê, şûndakarîyê û sazûmana feodal cephe girtîye, dî vê rêda pir tîkoşîn kırîye; alîkarîya rebenan, xizanan, bindestan û bersîteman kırîye. Wek hînek zanayên hev-demêd xwe ji karbidestanra û sîtemkaranra şalûzî ne kırîye, li dû mefayê ne bezîye. Kurta gotinê: Tim û tim li alî xelkêbûye. Mesela dî pêşgotina NÜBARA BIÇÜKAN'da gotîye ku:

## **HÂNÎ'NİN BİYOGRAFİSİ**

Ahmed-i Hânî 1651 yılında Hakkâri bölgesinin Hân köyünde dünyaya gelmiştir. Kısa bir sürede ilim ve kültürde ün salmış, bu alanda hayli ilerlemiştir, 14 yaşlarının dayken yazarlık hayatına atılmıştır.

Hânî Doğubayezit'de vefat etmiş ve orada defnedilmiştir. Fakat yazık ki vefat tarihi belli değildir. Türbesi Doğubayezit'te halkın ziyaretgâhıdır.

Hânî Kürt edebiyatına çok değerli hizmetler yapmış, birçok nefis şiir ve eser armağan etmiştir. Eserlerinin şaheseri MEM Ü ZÎN'dır. Ozan bu kitabı 1695 yılında tamamlamıştır. Hangi tarihte bu eseri yazmaya başladığı hakkında hiçbir belge yoktur. 1690 yılında başladığı söylemektedir.

NÜBARA BIÇÜKAN (Küçüklerin Turfandası) da değerli bir eseridir. Bu kitap Arapça - Kürtçe sözlüktür, o da MEM Ü ZÎN gibi manzumdur. Her bölümünün başında da okuma, çalışma, doğruluk ve bunlara benzer sosyal konular hakkında bir ögüt yazmıştır. Bu eserin yazılış tarihi 1684'tür.

Bunlardan başka EQÎDA İMANÊ (İnanç yolu) adlı küçük ve manzum bir eser yazmıştır. Bu eser NÜBARA BIÇÜKAN'la birlikte İstanbul'da birkaç defa basılmıştır.

Hânî, çağında çok ileri görüşlüydi; MEM Ü ZÎN'den de anlaşılaceği gibi haksızlığa, zulme, gericiliğe, feodal düzene karşı cephe almış, bu yolda hayli mücadele etmiştir; zavallıların, yoksulların, çaresizlerin ve haksızlığa uğrayanların yardımcısı olmuştur. Çağdaşı olan bazı bilginler gibi yöneticilere ve zalimlere dalkavukluk etmemiş, çıkar peşinde koşmamıştır. Kısacası: her zaman halktan

«Min ev nivîsi ne jibo sahib rewacan

Belkî jibo biçûkêd Kurmancan»

Jî vî jî bî eşkerayî tê zanîn ku xizmeta wî jî kesên xwedî rewac û xwedî meqamra, jî hendikêن bextewerra ne bûye; jî piranîya xelkêra, jî zarûkên xelkêra xizmet û xebat kırîye.

Hozanê mezin dî fikra xweda serbestbûye, bawerîyêd xwe bî wêrîn gotîye û nivîsiye, dî vê yekêda jî tu tiştekî fîkar ne kırîye û jî gotin û nivîsına rastîyê qet û qet paşda ne maye.

Xanî li dû moda wê demê ya arîstoqratîk ne çûye û wek zanayêñ din pirtûkêñ xwe bî zarê Erebî û Farîsi ne nivîsiye. Eserêñ xwe gîst bî zarê xelkê, bî zarê xweyê dê, bî zarê Kurdi nivîsiye û bûye yek jî pêşrewêñ bêjeyê Kurdi.

Hozanê nemir, dî meydana bêjeda çawa hunermendbûye, dî meydana felsefê û zanîyarîyêda jî wîsa dî pêpîlûkekî bilînddabûye. Dî vê yekêda jî zanayêñ Rohelatî hevtayê Fîrdewsî, Sadî, Fîzûlî û yêñ wek wanbûye. Çawa ku jî pirtûka wî jî tê fêmkîrin xwedîyê felsefekî pir kûr û zanîyarîyekî pir ferebûye.

Jî bil zarê xweyê dê Kurdi, bî zarê Türkî, Erebî û Farîsi jî baş dî zanibûye.

Gelek mixabin ku der heqê jîna wîda zanînekî bî sîpartek û wesîqe dî destê meda tunne. Lê ev yek tesellî dî de me ku, eserêd wî navê wî xîstine nava qora mîrovêñ nemir û wî timzîndî kîrîne.

yana olmuştur. Örneğin, NÜBARA BIÇÜKAN'ın önsözünde söyle demiştir:

«Ben bunu revaçtakiler için değil,  
Kürt çocukların için yazdım.»

Bundan da açıkça anlaşılıyor ki revaçtakiler ve makam sahipleri için mutlu azınlık için çalışmamış; halk çırğunuğu için, halk çocukların için çalışmış ve hizmet etmiştir.

Büyük Ozan düşüncesinde özgürdü, inandığını cesaretle anlatmış ve yazmış, bu hususta hiçbir şeyden endişe etmemiş, doğruya söylemekten ve yazmaktan hiç ama hiç geri durmamıştır.

Hâni o çağın aristokratik modasına uymamış ve diğer bilginler gibi eserlerini Arapça ve Frasça yazmamıştır. Eserlerinin hepsini halk diliyle, kendi ana diliyle, Kürtçe olarak yazmış ve Kürt edebiyatının öncülerinden biri olmuştur.

Ölümsüz Ozan, edebiyat alanında nasıl mahir idiysse, felsefe ve kültür alanında da oylece yüksek bir mevkideydi. Bu hususta Doğulu bilginlerden Firdevsi'nin, Sadî'nin, Fuzulfî'nin ve benzerlerinin dengiyidi. Eserinden de anlaşılacağı gibi derin bir felsefeye ve geniş bir kültüre sahipti.

Ana dili Kürtçe'den başka Türkçe'yi, Arapça'yı ve Farsça'yı da iyi bilirdi.

Ne yazık ki hayatı hakkında elimizde, belgelere dayanan bir bilgi yoktur. Fakat şurası bize teselli veriyor ki eserleri adını ölmez insanların safina katmış ve onu ebedileştirmiştir.

# I

## PESNË XWEDÊ

Sernameê name namê Ellah  
Bê namê wî natemane, wellah  
Ey metleê hisnê işqebazî,  
Mehbûbê heqîqî-yû mecazî  
Namê teye lewhê nameya işq  
îsmê teye neqşê xameya işq  
Bê neqşê te neqşê xame, xame  
Bê namê te name, natemame  
Namê teye şahê beytê meqsûd  
Fîhristê mikatebatê mehmûd  
Mazmûnê mîraselatê «lareyb»  
Meşhûdê mîkaşefatê bîlxeyb  
Mehbûbê qulûbê men lehul-qelb!  
Qelban tu dî kî bî bal xweve celb  
Masûq-ı tu'wî, bî fexr û nazî!  
Aşiq tu'wî, lêk-î bê nîyazî!

I

## **ALLAHA ÖVGÜ**

Kitabın baş yazısı Allahın adı

Vallahi eksik demektir kitap, olmazsa onun adı

Ey aşk güzelliğinin doğuş ufkı olan Allah!

Ey «aşk-ı hakikî» ile «aşk-ı mecazî»nin sevgilisi

Allah!

Senin adım üzerine yazılır aşk yazısı,

Aşk kaleminin nakşı da yine senin adındır.

Senin nakşın olmadan kalemin nakşı çığdır

Senin adım olmazsa yazı da eksik kalır,

Amaç edinilen Kâbe'nin şahı senin adındır,

Bütün kutsal yazılar da senin adında toplu hâlde durur,

Senin adındır tüm vahiylerin özü

Görünmeyip de keşfedilen varlıklar senin adında  
görünür.

Ey gönül sahiplerinin gönüllerinin sevgilisi,

Sensin gönülleri kendine doğru çeken!

Övünen ve nazlanan sevgili sensin!

Âşık da sensin, fakat dileksizsin.

Mitleq tu mifîd û mistefadî  
 Bê şibhe mirîd û hem miradî!  
     Nûrî tu dî hisnê rûyê dildar  
     Narı tu dî qelbê aşiqê zar! (1)  
 Şem'î, ne ji qismê nûr û narî  
 Şemsî, ji eyan tu perdedarî!  
     Gencî tu dî nêv tilîsmê alem  
     Kenzî tu eyan ji ismê adem  
 Ev alem û ademî-yû meşhûd  
 Ev mîmkun û masîwayê mewcûd  
     Hemyan bî teye midare û debr  
     Feyyazê rîyazê xelqê wel-emr!  
 Emrê te bî lefzê «Kun» du alem  
 Mewcûd-i kîrm, xerez çî adem  
     Adem bî xwe yek ji herduwane  
     Yek herfe ji emrê «Kun», fekane  
 Ew herfe heqîqeta mîheqqeq  
 Hem emre bî qudraeta te hem xelq  
 Eşbah-ı miressemin ji nasût  
 Erwah-ı miwessemin bî lahût  
     Ev rûh û cesed bî cebr û îkrah  
     Tezwîc-ı buwîn bî emrê Ellah  
 Nasût-ı eger çî rengsefale  
 Lahût-ı ji pertewa cemale  
     Herfa ku me gotî, neqşê hûre  
     Lê meqsed û maneya wê kûre  
 Zahir te eger numaye suxra  
 Batîn ewe neqşê xame kubra  
     Mewcûde dî wê, şehadet û xeyb  
     Meshûde dî wê, siyadet û cyb

(1) Aşiqê zar: Evindarê rebenê qelsê perişan.. Dî be ku ev kelîme di eslê xweda «Zar» be, lê bî şasbûn «Zar» hatîbe nîvîsin.

Fayda veren de, kendisinden yararlanılan da sensin!  
Şüphesiz hem isteyen, hem de istenensin!

Sensin sevgilinin yüzündeki aydınlık!

Zavallı âşıkın gönlündeki ateş yine sensin!

Mumsun ama ateş ve ışık çeşidinden değilsin,  
Güneşsin ama perdelenmişsin gözlerden!

Evren tılsımının içinde definesin sen!

İnsan adından keşfedilen hazinesin sen!

Bu evren, bu insan ve görünen bu varlıklar,  
Bu yaralıtan, senden gayrı bütün yaratıklar,

Hepsinin yönetimi ve geçimi seninledir,

Ey yaratışın ve emrin bahçesine feyiz yağdırın

Allah!.

Senin emrin «Ol» sözcüğüyle iki âlemi birden  
Varlığa getirdi; gerçi amaç insandi.

Bu iki âlemden biridir insanın kendisi,

«Ol» ve »Oldu» emrinin bir harfidir (1).

İşte gerçekten gerçek olan, o harftir;

Hem o emir, hem de yaratış senin kudretine bağlıdır.

Cisimler maddeden resmedilmişler,

Ruhlar ise kutsallıkla nişanlanmışlar.

Bu ruhlarla cisimler cebirle, zorla

Çiftleştirilmişler Allahın emriyle.

Maddenin değeri gerçi düşüktür

Ama kutsallık, güzelliğin ışığındandır.

İşte bu harf, işlemesiince bir nakıştır;

Gel gör ki amacıyla anlamı derin mi derin.

Gerçi görünüşte, sen onu en küçük olarak göstermişsin

Ama aslında o, en büyük kalemin nakşıdır.

Görünen ve görünmeyen hep onda mevcuttur;

Erdem de, kusur da hep onda gözükür.

(1) Şu anlamdaki âyete işaret ediyor: «Allah bir şeyi yaratmak istediği zaman, ona «Ol» der, o da hemen olur.»

Însan bî xwe hem zelame, hem nûr  
 Adem jî te hem qerîbe, hem dûr  
     Hindî weku cinsê alemîne  
     Ew tabîê new'ê ademîne  
 Ev renge felek hemî miezzem  
 Ev çende melek hemî mikerrem  
     Ev karîgeha ezîm û dewwar  
     Ev barîgeha bedî'û seyyar  
 Ev çende zemin digel enasir  
 Ev renge arez digel cewahir  
 Ev çende he nî'met û nefâis  
 Ev renge he me'kel û melabîs  
     Ev çende he middeâ û metlûb  
     Ev renge he müşteha û mehbûb  
 Heywan û meadin û nebatat  
 Metlûb û meqasid û miradat  
     Bîlcimle jibo mera li karin  
     Fîlcimle jibo me ber dî barin  
 Heqqâ, ku te xweş nîzam û rewneq  
 Tertîb-î kîrin jibo me, elheq!  
     Em xafil û atil û gunehkar  
     Mayîne dî qeydê nefsê emmar  
 Nînin me dî qelbê fîkr û zikrek  
 Na kin bî zimanê hemd û şikrek (1)  
     Xanî ku nehin bî qelbê zakir  
     Barî! Bî de wî zimanê şakir!

---

(1) Zîmanê: Dî vê rêzê û rêza pey vêyada «Zebanê» bû, me li şûna wan «Zîmanê» nivisi.

İnsanın kendisi hem karanlıktır, hem ışık;  
İnsan hem yakındır sana, hem uzak.  
Ne kadar evren çeşidi varsa,  
Hepsi insan çeşidine tâbidir.  
    Hepsi muazzam bunca felek,  
    Hepsi muhterem bunca melek,  
Dönüp dolaşan bu muazzam çark,  
Bu göz kamaştırıcı gezgin saray,  
    Bunca yerler ve unsurları,  
    Bunca ârazlar ve cevherleri,  
Bunca doyulmaz nimet ve değer,  
Ve bütün yiyeceklerle giyecekler,  
    Bunca aranan ve istenenler,  
    Bunca arzu edilen ve sevilenler,  
Hayvanlar, madenler ve bitkiler,  
Arananlar, amaç edinilenler ve muradlar;  
    Hepsi bizler için işler hâldedir,  
    Hepsi bizler için yük altındadır.  
Gerçekten güzel ve parlak bir düzen  
Düzenledin bizler için doğrusu sen!  
    Biz gafiller, tenbeller, günahkârlar,  
    Kötülük isteyen nefsimizle kayithyz.  
Gönlümüzde taşımıyoruz senin fikrini ve de zikrini,  
Dilimizle de ödemiyoruz senin hamdini ve de şükrünü.  
    Hânî, gönülden anmiyorsa eğer seni,  
    Allahım! Ona şükredici bir dil ver!

## II

### GAZIKIRIN Ú LAVAYÎYA JI XWEDERA

Ey şîkrê te cewhera zebanê!

Wey zîkrê te seyqela cenanê!

    Ey Wahidê bê şerîkê yekta!

    Wey Wacîdê bê nezîr û hemta!

Ey Baqiyê bê zewalê daîm!

Wey Hadiyê bê fenayê qaîm!

    Ey xalîqê erd û asîmanan!

    Wey xalîqê cimle ins û canan!

Mîlk û melek û felek bî carek

Bîlcimle te çê kîrin, tebarek!

    Subhanêke, kulleme xeleqte!

    Ehsente fe keyfe ma feleqte (1)

Herçî ku te çê kîr, ey nîkûkar!

Heryek dî hedê xweda sezawar

---

(1) Ev beyt giş bî zarê Erebiye, mana wê eve: Çî qas tiştên ku te aferandiye, ez jîbo wan te pak u paqîj dî dêrim, ez hemîyan dî ecibînum. Herçî tiştê kû te ji tunneyîyê anîye heyîyê, ji tarîtiyê anîye ronahîyê; bî ci awayî te çê kîribe te xweş çê kîriye, karêñ te hemî xweşin.

## **II**

### **ALLAHA ÇAĞRI VE YAKARIŞ**

Ey şükru dilin cevheri olan Allah!

Ey anması gönlü parıldatan Allah!

Ey eşsiz, ortaksız, bir olan Allah!

Ey emsâlsiz, benzersiz var olan Allah!

Ey zevâli olmayan, daima var olan bakî Allah!

Ey fâni olmayan, kendi kendine var olan, doğru yolu gösteren Allah!

Ey yerlerin ve göklerin yaratıcısı!

Ey bütün insanların ve cinlerin yaratıcısı!

Ülkelerin, meleklerin, feleklerin hepsini,

Maşallah, sen yarattın hepsini.

Her neyi yarattınsa güzel yarattın,

Her nasıl varlığa getirdinse güzel yaptınsın.

Ey işi güzel olan! Her neyi yarattınsa sen,

Her biri kendi yerindedir ve yerine lâyiktir.

Ev neh sedefêd-ı pir mirarı  
 Durrêd-ı sefid, şefaf û tarî  
 Heftêd-ı mîsalê durrê xelten  
 Herşes cihet û çîhar-ı erkan  
     Hersê weledêd-ı pir mewalîd:  
     Xezra û sema, dîgel meqalîd  
 Lewh û qelem û sewabit û ers  
 Heywan û nebat û maden û ferş  
     Zahir kîrîn ev qeder sanayî'  
     Peyda kîrîn ev qeder bedayî'  
 Heryek ji edem kîrîn te peyda!  
 İbda'î kîrîn te bê heyûla  
     Fîlcimle: çî ewwel û çî axır  
     Elqîsse: çî mi'mîn û çî kafîr,  
 Heryek ji tera we bûne mezher!  
 Ew renge dî wan tu bûyî mezmer!  
     Bê hisnê te nîne wan wîcûdekk!  
     Bê nûrê te nîne wan nimûdekk!  
 Hîkmet ewe batînî û zahir!  
 Qudret ewe xaîbî û hazır!  
     Nînîn te tecezzî-yû temekkun  
     Emma we dî van dî kî tewettun  
 Goya hemî cîsmekin, tu canî!  
 Goya hemî şehrekin, tu xanî!  
     Hisna teye zîneta hebîban!  
     Reşka teye xeyreta reqîban!  
 Meyla teye aşîqan dî kêşit!  
 Derdê teye dî ber dî êşit!

Dolu inci olan bu dokuz sedef,  
 Ak ve parlak inciler ve de siyahlar (1),  
 Birbirine katılmış inciler gibi olan yedili (2),  
 Her altı yön ve dört köşeler,  
 Doğmuş olup da çok doğurgan olan üçler:  
 Yani toprak, gök ve anahtarları,  
 Levh, Kalem, arş ve sabit yıldızlar,  
 Toprak, hayvanlar, bitkiler ve madenler;  
 İşte bu kadar sanat gösterdin sen,  
 Bunca güzel şey icadettin sen.  
 Bunların hepsini yokluktan sen var ettin,  
 İlk-maddeleri yokken nakşedip süsledin.  
 Hulâsa: İster başlangıç, ister son olsun;  
 Kisaca: İster inanan, ister inanmayanlar olsun;  
 Hepsi sana öylece ayna olmuş,  
 Sen de öylece onlarda gizlenmişsin.  
 Güzelliğin olmasa, bir varlığı olmaz hiçbirinin,  
 Işığın olmasa görünmezler bile.  
 Hem gizli, hem de açık oluşunun işte budur hikmeti;  
 Hem kayıp, hem de hazır oluşunun işte budur kudreti.  
 Parçalanmak ve yer almak yoktur senin için,  
 Fakat bunları kendine yer edinmişsin.  
 Sanki hepsi bir vücut, sen de can;  
 Sanki hepsi bir şehir, sen de han.  
 Senin güzelliğinle süslenir sevgililer,  
 Senden imrenerek rakipler gayrete gelir.  
 Âşıkları çeken, senin çekimindir;  
 Gönülleri sizlatan, senin derdindir.

(1) Sedeflerden maksatı, herhalde, güneşin gevresinde dönen dokuz gezegenin yörüngeleridir; incilerden maksat da, gezegenler.

(2) Yedili'den maksat, herhalde, «Büyük Ayı yada «Küçük Ayı» takımıdır.

Şêrîn te kire sekir li Perwîz!  
 Ferhad-i ji rengê eşkê xûnrîz!  
 Leyla te kire bela li Qeys-i!  
 Ramîn bî te ram-i bû li Weysi!  
 Yûsif te çira numa Zileyxa?  
 Wamiq te kusa gîhande Ezra?  
 Şêxê weku pênce hec bijarî,  
 Dîn kir te jibo keça kufarî! (1)  
 Nilûferê nazeperwerî kîr!  
 Ew ji te li mîhrê mîsterî kîr!  
 Balayê bilind te daye serwan!  
 Pabendê bela te da tezerwan!  
 Bîlbîl te kîrin hezar-i şeyda!  
 Sorgul te kîrin ji xarê peyda!  
 Xweş rengê te da gîyayê sorgul!  
 Xweş dengê te da newayê bîlbîl!  
 Ronahî te da serê şemalan!  
 Perwane kîrin bî şewqê talan!  
 Mehbûb-i te çê kîrin dî dilkes!  
 Meczûb-i te pê kîrin müşewwes!  
 Ev işq û mehebbeta dî dilda  
 Ev zîlf û selasîlê dî mîlda,  
 Aya, ne te çê kîrin miqabil!  
 Heryek te bî hev kîrin miadûl!  
 Ayîne te çê kîrin mikerrîr!  
 Hisna xwe dî wan te kir müşewwer!  
 Ayîne li pêşê tûtiyan girt!  
 Davek te li pêşê kûviyan girt!  
 Ayîne, ji wan weye ku ave  
 Ew eksê, ji wan weye ku tave

(1) Şêx: Şêxê Sen'anî ku lî du keça Padışahê Ermenistan'ê çû û jibo wê çû dêrê, meyê ve xwar, gavenîya berazan kîr, paşê ji keçikê kîr misîlman u revand anî. Feqiyê Teyran çîroka wî bî şê'r nîvîsiye.

Şirin'i Perviz'e şeker yapan sendin;  
Ferhad'a kanlı gözyaşları döktüren de sen.

Leylâ'yı Mecnûn'a sen belâ ettin;  
Ramin'i Veysi'ye sen râm ettin.

Yusuf'u nasıl Züleyha'ya gösterdin?  
Vâmik'i neden Azra'ya kavuşturdun?

Elli hac edâ eden o şeyhi de,  
Gâvur kızı için sen delirttin (1).

Nilüfer'i nazlı büyüten de sensin,  
Büyüküp güneşe müsteri eden de sen.

Servilere o uzun boyu veren sensin,  
Sülünlerin ayağını bağlayan da sen.

Kırmızı gülü dikenlerden çekip çıkaran sensin,  
Ve sensin bülbülü bin deliye döndüren.

Gül bitkisine güzel rengini,  
Bülbüle o güzel sesini veren de sen.

Mumların ucuna ışığı yerlestirensin,  
Pervaneyi sevdâ ile talan edensin.

Dilberleri gönül çekici yaratıp yaratıp  
Meczup âşıkları sersemletensin.

Gönülleri dolduran sevgi ve aşk,  
Omuzlardan dökülen zülfü ve örgüler,

Seninle var olup yüzyüze durdu,  
Seninle birbirlerine uygun düştüler.

Kendi güzelliğin yansısın diye,  
Ardarda aynaları yaratan sensin,  
Aynaları Tûtî'lerin önünde tutan da sen,  
Canavarların yolunda tuzak kuran da.

Onlar aynayı su sanırlar,  
O yansıyı da güneş ışığı.

(1) San'an Şeyhinin hikâyesini kasdediyor.

Neqşê te dî bînîn ew dî avê  
 Na kîn hezerê ji av û davê  
 Lebteşne teleb dî kîn zelalê  
 Wî dane û damê zîlf û xalê  
 Meqsûd-i ku bû ji pêşve hazır  
 Dê qesd-i bî kîn cemîê nazir  
 Tûtî bî xwe, ma şekir dî rêjin?  
 Herçî dîbihêñ, ewî dî bêjin  
 Wê meqsedê mixteser dî bînîn  
 Pabende dî bîn, gelek dî mîn  
 Meqsûd û miradê dil tu şâ'yî!  
 Emma tu «Tudillu men tesâ» yî!  
 Herçî te dî vê bî bî dalalê  
 Pabende dî kî bî zîlf û xalê  
 Herçî ku tu bîmî ser hîdayet  
 Vêra bî girî, bî kî inayet,  
 Hazîr wî dî bî meqamê malûm  
 Ger xadîme wî dî gêrî mexdûm  
 Bê secde te ey cenabê Mabûd!  
 Adem kire qîblegah û mescûd  
 İsa te kusa gîhande ewcan?  
 Aya bî çî te hebandî ew can?  
 Dersa ku bî xef te gote İdrîs  
 Elbette dî çû meqamê teqdîs  
 İblîs'ê feqîrê bê cînayet,  
 Hîndî te hebû dîgel inayet  
 Her rojê dî kir hezar-i taet  
 Lewra ku te da wî istîtaet  
 Wî secde ne kir li xeyrê Mabûd  
 Gêra te ji ber derê xwe merdûd  
 Yek secde ne bir li pêşê exyar  
 Qehra te kire mixelledun-nar  
 Elqîsse: ji hîkmeta te agah  
 Ferdek me ne dî, tebarekellah!

Suda görürler senin nakşını,  
 Ve ne sudan sakınırlar kendilerini, ne güneşten.  
 Dudağı kuruyanlar duru su arar elbet,  
 Gel gör ki o benle zülfü tuzak ve yemdir.

Amaç önde hazır olunca,  
 Amaca yönelecek elbet her gören.  
 Tüt'lérin şeker dili kendiliğinden mi?  
 Hayır... Ne duyarlarsa, onu söylelerler.

Onlar o amacı yakın görür,  
 Ve bağlanır ayakları, takılıp kalırlar.  
 Gönlün amacı ve muradı sen şahsin,  
 Gel gör ki sen de saptırırsın dileğini yolundan.

Ve yolundan saptırmak istedigin kimsenin  
 Ayağını zülfü ve benle bağlarsın.  
 Doğru yola getirmek istedigin,  
 Desteklemek, yardım etmek istedigin kimseyi de

Derhal bilinen makama götürürsün,  
 Ve hizmetçi bile olsa efendileştirirsin.  
 Ey tapınan Allah! Sen, sana secede etmeden önce  
 Âdem'i kiblegâh yaptı, ona secede ettirdin.

Nasıl ulaştırdın yücelere İsa'yı!  
 Acaba o canı sen neden sevdi?  
 Gizlice İdris'e verdigin ders,  
 Onu kutsal makamlara götürürecek elbet.

Zavallı günahsız Şeytan,  
 Sen kendisine o denli yardımcıdın ki,  
 Günde bin ibadet ediyordu:  
 Çünkü sen güc vermişsin ona.

O, Tanrıdan başkasına secede etmedi;  
 Sen de onu tardettin kapından.  
 Bir defa olsun secede etmedi başkasının önünde;  
 Kahrın, onu ebediyyen ateşe çaptırdı.

Hulâsa: Senin hikmetinden anlayan  
 Bir tek fert görmedik, maşallah!

Îrfantelebêd-ı sahîb îdrak  
Der heqqê te gotî: «Ma erefnak»  
Xanî bî nezanîya xwe der heq  
Gumrah-ı bî bit, ne dûre, elheq  
İlla ku meger inîn Xweda bit  
Ya raheberê wî Mustefa bit  
Yareb! Tu bî heqqê Mustefa kî,  
Xanî bî xwera tu aşîna kî!

İdrâk sahibi olup da irfan arıyanlar,  
Senin hakkında, «Tanımadık» dediler.  
Hânî, şu bilgisizliğiyle senin hakkında  
Sapıklığa düşerse çok değil, inan.  
Meğer yardımcısı Allah ola  
Ya da rehberi Mustafa!  
Allahım! Mustafa'nın hakkı için,  
Hânî'yi kendine âşina kil!

### III

#### PESNÊ PÊXEMBER

Eşya bî heseb delîl û birhan  
Na bîn çû meger wîcûb û imkan  
            Wacîb yeke, zatê Kîbrîya'ye  
            Mîmkun pire, cem'ê masîwaye  
Wî Wacîbê mîmkînat-î berqe'  
Mîmkun wî jîbo xwe kirne metle'  
            Yanî ewî, vî bî bit mîberhen  
            Hisna wî bî der kevit ji mekmen (1)  
Gencîneyê cewherê bî bit faş  
Sabit bî bitin ji neqşê, neqqas  
            Lê sen'etê wî Hekîmê zana (2)  
            Neqşê ewî Qadîrê Tewana  
Ne'dbû ku bî bit ewî rîsûmek  
Layiq ewî dê hebit rîqûmek  
            Hercî weku bûne, bê reqembû  
            Lew ewwelê ma xeleg qelembû

---

(1) Ewî vî bî bit mîberhan: Ew Xweda bî van tiştan bî be bî delîl, van tiştan ji heyîya wîra bî bin delîl.

(2) Zana: «Dana» bû, me li şûnê «Zana» nîvîsi.

### **III**

#### **PEYGAMBERE ÖVGÜ**

Varlıklar, deliller ve kanıtlara göre,  
Asla zorunlu ve zorunsuz olmazlar.

Varlığı zorunlu olan birdir, o da Zat-i Kibriyadır.  
Varlığı zorunsuz olanlarda tüm yaratıklardır.

Yaratıklarla perdelenen o varlığı zorunlu,  
Kıldı yaratıkları kendine doğuş ufku.

Ki varlığı bunlarla ispat edilsin,  
Ve gizlenen güzelliği çıksın ortaya,

Fas olsun cevher defnesi; meydana çıksın,  
Nakşın varlığından varlığı nakışçının.

Fakat o bilgili Hakimin sanatı,  
O güçlü ve kudretli nakışçının hüneri,

Kalabilir miydi tek bir resimle?  
Ona lâyık bir yazı gereklidi.  
  
Var olanların hepsi yazısızdı,  
Bunun için kalem oldu ilk yarattığı.

Ev ewwel û rûh û aqlê ewwel  
 Hersêne bî ewwelê miewwel (1)  
     Emma me ke wan ji hev tu tefriq  
     Ev renge ewan bî gêre tewfiq:  
 Bê: «Şey'ekî wahidin bî carek»  
 Te'dad û teeddud i'tibarek (2)  
 Ewwel biriqî ji hisnê sermed  
 Nûrek bûye maneya Muhammed  
     Ew nûr-ı bî emrê Alîmul-xeyb  
     Bû menşeê feyzê alema xeyb  
 Erwah-ı ji maneya Pêxember  
 Çê bûn, mesela nebat û şekker  
     Bû eslê esîlê cimle nefsan  
     Nefsa sueda û nefsê nehsan  
 Hemyan ji wî girtine teferru'  
 Hemyan bî wî girtine temettu'  
     Hêja ne zemîn, ne ev semabû  
     Ew serwerê cimle enbîyabû  
 Xelqa felekan jibo wîra bû  
 Secda melekan jibo wîrabû  
     Ew rehmetê cimle alemînbû  
     Adem dî meyanê ma'û tînbû  
 Pêxemberê cem'ê cuz'û kulbû  
 Adem bî xwe hêj-ı av û gîlbû  
     Ew pencereye cemalê Barî  
     Şemsa feleka dîlêd-ı tarî  
 Gava kete sûretê cîhanê  
 Peyxemberê axirê zemanê,  
     Wî berzexê mimkînat û Wacib  
     Wî padîşehê li şîklê hacib,

(1) Ev ewwel: Yanî qelemler. Bî ewvelê: Bî çêbûna berî tişten din.

(2) i'tibarek: Ev i'tibarekiye, wîsa hatîye qebûlkirin. Yanî vana dî eslê xweda yekin, lê cihê hatîne téwkirin.

İste bu ilk, ruh ve akließvel,  
Bunların üçdür ki «İlkler» kabul edilir.

Fakat onları birbirinden ayrdetme,  
Şöylece onları bağdaştır:

De ki: Hep birden bir tek şeydir,  
Sayılmaları ve sayılır olmaları itibarıdır.

Ebedî güzellikten ilk defa parlayan,  
Bir ışıkçı; onun anlamı da Muhammed'di.

İste o nurdur ki görünmeyenleri bilen Allahın emriyle,  
Görünmeyen evrenin feyzine kaynak oldu.

Ruhlar, Peygamberin anlamından,  
Yaratıldılar; örneğin şeker ve bitki.

Oldu tüm canlıların ilk kökü,  
Hem mutluların, hem günahkârların canlarının kökü.

Hepsi ondan dallanma bulmuşlar,  
Hepsi onunla zevke ermişler.

Henüz ne bu yer, ne bu gök vardı.  
Serveriydi o tüm Peygamberlerin.

Onun içindi feleklerin yaratılışı,  
Meleklerin secdesi yine onun için.

Âdem henüz su ve çamur içindeyken,  
O, bütün âlemler için rahmetti.

Bütün cüz'lerin ve küllerin Peygamberiyken o,  
Henüz su ve çamurdu Âdem'in kendisi.

Allahın güzelliğinin o penceresi,  
Karanlık gönüllerin felegini aydınlatan o güneş,  
Dünyalı şekline girdiği an,  
Oluverdi son zamanlar Peygamberi.

Valığı zorunlu olanla olmayanları ayırdeden o sınır,  
O vezir kılığındaki Padişah,

Mensûx-ı kırın wî dîn û millet  
 Ma'lûl-ı kırın elîl û illet  
     Fîkrî ku cîhan cemî'i kufre  
     Kêşa jî nîbiwweta xwe sifre  
 Xelqê ku hebûn lî rûyê erdan  
 Teklîf-ı kırın hemî bî merdan  
 Xaqañ bî xwe Hindoyê kemînbû  
 Fexfûr-ı jî xwanê kase, çînbû  
     Qeyser bî qusûrîya xwe qasîr  
     Hazîr gerîya bî eynê basîr  
 Şahê Erebî elem ku ra kîr  
 Kisra'yê Ecem, eceb duta kîr  
     Rom û Hebeş û Fireng û Tatar  
     Herçî ku ne kîr bî dîn-ı îqrar,  
 Naçar-ı gelek bî şûr fena bûn  
 Hetta ku hinek bî dîn teba bûn  
     Pûtxane bî agîrê dî şuştîn  
     Ateşgede cimlekî ve kuştîn  
 Gava ewî dîn kîr aşîkara  
 Dawûdî-yû Sibtî-yû Nesara,  
     Tewratê ewan jî bir kîr ekser  
     Încîl û Zebûr-ı çûn jî ezber  
 Isa'yî dema dî xwendî Încîl  
 Behsa wî dî kîr bî wehy-û tenzîl  
     Go: «Mîjde dî dîm, Resûlê Emced  
     Dê paşê me bê, bî navê Ehmed»  
 Da'wa xwe dî kîr bî dest û ezman  
 Destê wî bî şûr, û dev bî qur'an  
     Xwesxîlqete, hem Resûle, hem Mîr  
     Pîrhîkmete, hem kîtabe, hem şîr  
 Naxwande sebeq, miderrisê am  
 Bê mal û menale, sahib-în'am  
     Bê xeyl û heşem, bî xwe cîhangîr  
     Bê tebl û elem, cîhan sedagîr

İptal etti tüm dinleri ve de kitapları  
Gösterdi herseyin kanıt ve nedenini.

Baktı ki dünya küfürle dolu,  
Çekti peygamberliğinden bir sofra,  
Yer yüzünde bulunan bütün halkları,  
Cömertçe o sofraya buyur etti.

Hâkan, pusuya yatmış bir Hindu idi.  
Fağfur da kâseden içişinden iki büklümdü.  
Kayser kendi kusuruyla kısa kalmıştı,  
Derhal gözüyle gören oldu.

Arap şahı bayrağı kaldırınca  
Acem Kisra'sını da iki büklüm yaptı... Şaşılacak şey  
Rumlardan, Habeşlerden, Frenk ve Tatarlardan,  
Dini kabul etmeyen kimselerin,  
Çaresiz çوغу kılıçla yok oldular.  
Tâ ki bir kısmı dine katılıncaya dek.  
Puthaneleri ateşle yıkardı,  
Tapınaklarını yok etti tüm atesperestlerin.

O, dini açıkladığı zaman.  
Davut dininden olanların, Yahudî ve Hıristiyanların,  
Tevrat'ı unuttu çوغу,  
İncil ve Zebur da çıktı hatırlarından.

İsa İncil'i okuduğu zaman,  
Vahiyle ve Allahın emriyle bahsederdi ondan.  
Dedi ki: «Müjde veriyorum şanlı bir Peygamber,  
Bizden sonra gelecek, adı Ahmed'dir»

Dâvasını elle ve dille yürüttürdü o,  
Elinde kılıç, dilinde Kur'an vardi.  
Güzel yaratılışlıydı, hem Peygamber, hem Hükümdardı,  
Hikmetliydi serâpa, hem kitabı, hem de kılıcı vardi.

Kamu öğreticisiydi, daha önce okumadan;  
Mal mülk sahibi değil, iyilik sahibiydi.  
Atsız ve maiyetsiz, oldu cihangir,  
Doldurdu sesi dünyayı, davulsuz ve bayraksız.

Herçî te dî dî meger her-ew bû  
 Lesger jî cinûdê «Lem terew» bû (1)  
 Bê xeyme û barîgah û eywan  
 Ewran ve dî da lî ser wî seyan  
     Hindî ku jî pêşve baxeberbû  
     Ew çende jî piştve babeserbû  
 Sîhdan ne dî ket jî wî li erdan  
 Vêkra dî bîhistî sed xeberdan  
     Goyende dî bûn digel, cemadat  
     Peywende dî bûn digel, nebatat  
 Yek new'ê nema jî cinsê heywan  
 Nîna bî nibiwweta wî iman  
     İlla ku hinek jî ibnê Adem  
     Bûn derxurê agirê cehennem (2)  
 Elqisse: Dî erd û asîmanan  
 Hasil: Dî cemî'ê îns û canan  
     Ev bê meddedêd-i ummeta xwe  
     Mîmtaz-i kîrin bî hîmmeta xwe  
 Wer'a wî we rengî dîn qewî kîr  
 Ser'a wî sîratê mistewî kîr  
     Alîm hemî şibhê enbiyane  
     Abîd hemî pêkve ewlîyane  
 Ferdek jî sehabeyêd-i Kubber  
 Pênsed jî delawerêd-i kuffar,  
     Ew cimle digel yekê seraser  
     Ne'dbû bî mehabetê beraber  
 Xelqê heye şibheyek dî dînê  
 Behsê bî cedel bî ket jî dînê,

(1) «Lem terew»: Ev parçekî jî ayetekîye, mana wê «We ne dî dîtin»; Xwdê dî vê ayetêda qala Şerê Huneyn'ê dî ke û dî bêje: «Me jibo alikariya Pêxember'ê xwe hinek sipahan şand ku we wan ne dî dîtin».

(2) Agirê: «Ateşê» bû, me li şûnê «Agirê» nîvîsi.

Gördüğüin hersey meğer O'yu, Ordusu görünmez askerlerdendi. (1)

Çadırsız, hansız, saraysızdı o, Gölgeliği bulutlardı.

Önden haberdar olduğu kadar Arkadan da görürdü.

Ondan, gölge düşmezdi yerlere. İşitirdi bir arada yüz konuşmayı.

Cansızlar da konuşurdu onunla. Filizlenirdi bitkiler onunla.

Onun peygamberliğine inanmayan, Kalmadı bir tek çeşit hayvan.

Yalnız Adem oğullarından bazıları, Yem oldular Cehennem ateşine.

Kısacası: Yererde ve göklerde, Hulâsa: Bütün insanlar ve cinlerde,

Onun şerefine denk gelecek birsey yok, Ondan gayrı bize arka olacak kimse de yok.

Doğruluğuyla güclendi din, Seriatıyla doğruldu yol.

Bilginlerin hepsi peygamber gibidir, Abidlerin hepsi evliyalar gibidir.

Onun büyük sahabelerinin tek bir ferdi, Gâvurlardan besyüz yiğit sayılır.

Tüm gâvurlar bir araya gelsin, heybetçe Bir tek sahabeye eşit değildir.

Onun dininden şüphe edenler için, Dinini tartışıp eleştirenler için,

---

(1) Hüneyn savaşından bahseden «Allah yardımınıza, görmediğiniz askerler gönderdi» anlamındaki ayete işaret ediyor.

Qur'an û xeber çi mi'cîzatin!  
Ayat û siwer çi beyyînatın!

Bûbekr û Umer çi xwes qerînîn!  
Usman û Elî eceb guzînîn!

\*\*

Ey Padîshê bilindepaye!  
Xursîdê felek nişîn û saye! (1)

Ne'tê te bî îlmê min mihale  
Meddah-i jîbo te Zîlcelal'le

Ez dê çi bî bêjîm? Ey Şehînsah!  
Wessafê teye kelamê Ellah

Şaha! ji tera xwes îsme «Yasîn»  
Taha! ji tera tilîsme «Tasîn» (2)

Her ev bese, ey Hebbîbê Muxtar!:  
Barî ji tera bî jî te sond xwar (3)  
Sed carî bî jî te, ey keremkar!:  
Ger dê me hebin guneh dused bar,

Sed mertebe ger çi em xirabîn,  
Emma ji te naumîd-i na bîn  
Hetta bî gîhîte Xanî'yê jar  
Napak û Peliîd û wacîbun-nar

(1) Saye: Si. Yanî roja felekê bî qedrê xwe û bî rûmeta xwe ji te pîr kêmture, li bin teye, wek ku tu li serê rûni, û ew wek siya teye.

(2) «Yasîn» û Taha: Du navê Pêxemberin her yek dî qur'anêda dî serê sûrekîda hatîye. «Tasîn»: Ev du herfîn Erebî'ne, weha têr nivisîn:  û «Tasîn» têr xwendîn, dî serê sûrekî

qur'anêda hatîne, lê kes bî mana wan ni zane.

(3) Bî jî te: Bî jîna te, bî umrê te; ev işaretete bî alî ayetekî qur'anêve Ku Xwedê têda bî umrê Pêxember sond xwariye.

Kur'an ve hadisler ne güclü mucizelerdir!  
Âyetler ve sureler ne açık delillerdir!

Ebubekir ve Ömer ne iyi arkadaşlarıydı onun!  
Osman ve Ali ne seçkin yakınlarıydı onun!

♦

Ey yüksek payeli Padişah!  
Ey tahtı felek güneşinin Padişah!

Benim bilgimle ne mümkün seni övmek!  
Büyük güç sahibi Allahtar seni öven.

Ben ne diyeyim; ey Şehinşah!  
Seni Allahın sözleri övdükten sonra?

Şahîm! Senin için güzel addır «Yasîn» (1)  
Tâhâ! Senin tâlimindir «Tâsin» (2)

Ey seçkin sevgili! Senin için şu yeter ki:  
Allah senin hayatına andıktı. (3)

Yüz defa hayatına andolsun ki, ey işi iyilik olan!  
Bizim ikiyüz yük çekse de günahlarımız,

Ve şu yüz derecelik kötülüğüümüzle,  
Yine senden ümitsiz olmayız bizler.

Hattâ şu zayıf Hânî bile,  
Şu paklıktan uzak, kem kişi, şu ateşe müstahak olan  
Hânî,

(1) Yasîn: Peygamberin bir adıdır, Kur'anın bir suresinin başında gelmiştir.

(2) Tâhâ: Peygamberin bir adı olup, bir surenin başında gelmiştir. İki Arap harfidir. Şöyledir yazılır: « » ve «Tâsin» okunur. Bir surenin başında gelmiştir, anlamını bilinmemektedir.

(3) «Hayatına andolsun ki onlar sarhoşluklarında bocalıyorlar» anlamındaki âyete işaret ediyor.

Ew jî bî xîrabî-yû seyînî  
Da'wa dî ketin bî ummetînî

Wî bed'emele wekî kîlaban  
Barî bî ke peyrewê sehaban

O da kötülüğü ve köpekliğiyle,  
Ümmetten olduğunu iddia ediyor.

Köpeklerden farksız o kötü-isliyi de,  
Allah sahabelerin yolunda götürsün.

## **IV**

### **DAXWAZA MEHDERÊ JÎ PÊXEMBER Û DAXWAZA EFWÊ JÎ XWEDÊ**

Ey wasîteyê wicûdê kewneyn!  
 Şayesteyê qurbê «Qabe qewseyn» (1)

Şahînşehê textekê Medîne!  
 Mi'ciz jî te ew qeder me dîne

Seyra felekan lî nik te gavek  
 Fexra melekan jî te silavak

Şeqquel-qemera te yek işaret  
 Zaxel-besera te yek ibaret (2)

(1) Qurbê qabe qêwseyn: Nêzikiya bî qasê du kevanan; ev işaret di ke bî alî vê ayetêve: «Dî mîracêde Pêxember bî qasê du kevanan nêzê Xwedê bû..»

(2) Şeqquel-qemer: Qetkîrîna Hîvê; ev işaretete bî alî mi'cîza Pêxember ku wî bî işaretekî hîvê kîriye du qet. Zaxel - beser; Şîmutîna çav; ev işaretete bî alî vê ayetêve: «Pêxember şeva mîracê Xwdê dît çavê wî ne şîmutî.» Yek ibaret: Yek gotinekî, ku ew jî di qur'anêdaye.

## **IV**

### **PEYGAMBERDEN ŞEFAAT, ALLAHTAN DA AF**

Ey iki âlemin varlığına yol açan!  
«İki yay kadar» yaklaşmaya lâyik olan! (1)

Medine tahtının Şehinşahı!  
Senden o kadar mucize görmüşüz ki...

Senin için bir anlık iştir feleklerde yürümek  
Ve senden bir selâmdir meleklerin kıvancı.

Ayı ikiye bölmek için bir işaretin yeter,  
Ve bir sözcük yeter gözlerinin yanlışmadığını  
ispatlamaya (2)

---

(1) İki yay kadar: Peygamberin miraçta Allaha yaklaştığı mesafedir.

(2) Peygamberin gözlerinin yanlışmadığı, söylediğlerini gerçekten miraçta gördüğü hakkındaki âyete işaret ediyor.

Ey Padîşehê serîrê «Lewlak»! (1)

Ra be here asîmanê, çalak!

Hazir ji tera Buraq û Refref

Satır bî tera Fîrişte ref ref

Da ref'i bî bin ji ber te perde

Bê perde digel Xwedê xeber de!

Bêjê: «Tu Qedîr û Zîlcelal'î»

Bêjê: «Tu Qedîm û Layezal'î

Em fanî-yû jar û müştexakîn

Hadî ne tu bî, xwe em helakîn

Ewwel te jibo çî da me tazîm,

Danî li serê me tacê tekrim, (2)

Teşrifê xîlafetê te da me? (3)

Gava te emanêtê xwe da me,

Malûmê tebû ku em nezanîn

Qedrê wî emanetî nî zanîn

Herçî te jibo me kir îrade

Yek zerre me lê ne kir zîyade

Haşa ji kemalê re'feta te,

Dûre ji celal û rehmeta te

Kufr û gunehan bî kî behane

Laîq te bî tîn... Eve şehane?

Yekrûne li nîk te kufr û îman

Yeksûne li nîk te xuld û nîran

Qehra xwe bî kî eger tu zahir

Cennet li me dê bî bîte agrî

(1) Lewlak»: Ev serê gotinekî Xwedêye, mana wê «Eger ne tu bûya»; Xwedê ji Pêxember'a gotîye: «Eger ne tu bûya min felekan ne di aferand.»

(2) Tekrim: Qedîrbilindî; ev işaretecî bî alî wê ayeta ku di bêje: «Me kurên Adem qedîrbilind kîr»

(3) Xîlafet: Wekiliya Xwedê; ev işaretecî bî alî wê ayeta ku di bêje: Xwedê soz da misî manêñ karbaş, ku dê wan di erdêda bî ke wekil, çawa ku ên berî wan ji kırıbû wekil...»

**Ey «Levlâk» tahtının padişahı! (1)**

Kalk ta çabucak göklere çek.

Emrine amadedir burak ve kanatlar,

Maiyetinde gelir saf-saf melekler.

Kalkiversin önünde tüm perdeler,

Perdesiz olarak konuş Allahla.

De ki: «Sen kudret ve azamet sahibisin»

De ki: «Hep vardın sen, hep var olacaksın.

**Bizler fâniyiz, zayıfız, toprak seviyesindeyiz,**

**Helâk oluruz hepten, sen doğru yola götürmezsen.**

Önce bizlere niye azamet verdin

Başımızın üzerine koydun şeref tacını, (2)

Vekillik şerefini verdin bizlere? (3)

Oysa sen bize emanetini verdiğin zaman,

Sence biliniyordu bilgisizliğimiz,

Ve o emanetin kadrını bilmeyeceğimiz.

Her neyi irade ettinse sen bizim için,

Ona bir zerre olsun eklemedik biz.

Hâşa senin sonsuz şefkatinden,

Uzaktır senin büyülüğünden, rahmetinden,

Küfür ve günahları bahane etmek,

Ve sana lâyık olsun bu... Bu mu padişahlık?

Bir yüzlüdür senin katında küfürle iman

Eşittir senin katında cennetle cehennem.

Sen kahrimı gösterirsen eğer,

Ateş olacak bizlere cennet.

(1) «Levlâk»: Allahın Peygamberc yönelttiği bir hitabın başıdır. Bu hitabın tamamı şudur: «sen olmasaydın ben felekleri yaratmadım.»

(2) «Biz insanlığını şerefli yarattık» diyen âyete işarettilir.

(3) Şu âyete işarettilir: «Allah, inanıp iyilik eden kullarını yüzünde kendine vekil yapacağına söz verdi..»

Wer feyz-i bî ket sehabê rehmet  
 Dozex lî me dê bî bîte cennet  
     Ger kafîr û ger gunahkarin  
     Bîlcimle jî te umîdewarin  
 Kes nîne jî kafîr û usatan  
 Mezher ne bitin jibo sîfatan  
     Kafîr buwîn em bî îsmê «Qehhar»  
     «Xeffer»e ku em kirîn gunehkâr  
 Kufrê tu meger ne şî bî bexşî?  
 Ger dê gunehan bî me bî nexşî,  
     Dê şad-i bî bin lî me şeyatîn  
     Mesrûr-i bî bin gelek melaîn»

\* \*

Qet xîrete ey penahê alem!  
 Qet laîqe, Ey şivanê adem!  
     Ev gurgê leînê bed, serencam  
     Jêkra bî ketin me şibhê exnam?  
 Elqîsse: Bî kî ku dêwê serkes  
 Tenha û tenê bî çîte ates  
     Filcimle: Me cimle xas û aman  
     Asî-yû şeqî-yû natemaman,  
 Têkra bî şefaeta xwe xas ke  
 Vêkra me jî agîrê xilas ke

Ve feyiz yağdırırsa bulutları rahmetinin,  
Cehennem bizler için cennete dönecektir.  
Gerek gâvurlar, gerek günahkârlar,  
Hepsi senden umutludurlar.

Gâvurlardan ve günahkârlardan kimse yoktur ki,  
Senin sıfatlarına ayna olmasın.  
Bizler «Kahredici» adıyla gâvur olduk,  
«Bağıslayıcı» adındır ki günahkâr kıldı bizleri.  
Sen küfrü de bağışlıyamaz mısın ki?  
Günahları üzerimizde nakşedecek olursan,  
Seytanlar var sevinecek halimize,  
Ve sevinecek sayısız mel'un var.»

::

Hiç hamiyet kârı mı ey âlemin dayanağı!  
Hiç yakışık alır mı ey insanların çobanı!  
Bu pis mel'unun, sonunda,  
Bizleri koyunlar gibi darmadağın etmesi?  
Kısacası: Öyle yap ki o serkes dev,  
Yalnız ve tek başına gitsin atese.  
Hulâsa: Yakın ve uzak olan hepimizi,  
Günahkârları, bedbahtları ve kem kişileri,  
Şefaatinin içine al hepsini,  
Bizleri hep beraber ateste kurtar.

V

**DERDÉ ME**

Saqî! Tu jibo Xwedê kerem ke  
Yek cir'e meyê dî camê Cem ke (1)  
Da cam-i bî mey cîhannuma bit  
Hergî me îradeye xuya bit  
Da keşf-i bî bit lî ber me ewhal  
Kanê dî bitin miyesser îqbal?  
Îdbarê me wa gîha kemalê  
Aya buwe qabilê zewalê?  
Ya her wehe dê lî istîwa bit,  
Hetta wekû dewrê minteha bit?  
Qet mîmkune ev ji çerxê lewleb:  
Tali' bî bitin jîbo me kewkeb,  
Bextê me jibo mera bî bit yar  
Carek bî bitin ji xwabê hesyar

.....  
.....

---

(1) Camê Cem: Qedeха Padışahê Iran'ê Cümşid, ku têda gelek  
tiştén dûr dî xuya, wek Telesqop'ê búye. Hozan qedeха xwe ji  
dirûbandîye bî wê qedeхê.

**V**

**DERDİMİZ**

Sâki! Allah için lütfet,  
Cem kadehine koy bir yudum şarap. (1)  
    Kadeh şarapla dünyayı göstersin,  
    Görünsün dileğimiz ne varsa.  
Aydınlığa kavuşsun önumüzde durumlar,  
Gelecek bizim için başarılı olacak mı, bilelim.  
    İşte kemale erdi talihsizliğimiz,  
    Acaba zevale yüz tuttu mu dersin?  
Yoksa hep böyle olduğu yerde mi kalacak,  
Son devir gelip çatincaya dek?  
    Mümkür mü acep felek çarkından,  
    Bizim için de çıksın bir yıldız,  
Bize yar olsun bahtımız,  
Bir defada uykudan uyanıversin,

.....  
.....

---

(1) Cem: Eski İran İmparatoru Cemşit. Kadehi teleskop gibi yıldızları gösterirmiştir. Ozan kendi kadehini de onunkine benzetmiştir.

Şûrê hunera me bête danîn  
 Qedrê qelema me bête zanîn  
 Derdê me bî bînitin îlacê  
 Îlmê me bî bînitin rewacê?  
 Ger dê hebuwa me serfirazek  
 Sahibkeremek suxennuwazek,  
 Neqdê me dî bû bî sîkke meskûk (1)  
 Ne'dma wehe bê rewac û meşkûk  
 —Her çendî ku xalis û temizin  
 Neqdeyn-i bî sîkkeyê ezîzin—

.....  
.....  
.....  
.....  
.....  
.....  
.....  
.....

Xemxwarî dî kîr lî me yetîman  
 Tinane derê ji dest leîman

.....  
.....  
.....  
.....  
.....  
.....  
.....  
.....  
.....  
.....

Herçî bire şûrê destê hîmmet  
 Zebt kîr ji xwera bî mîrî dewlet

(1) Neqd: Zêr û zîv. Lî vir bî mecazî dî mana bêjeda hatîye gotin.

Kılıcı ortaya konsun güçümüzün,  
Bilinsin kadri kalemimizin,  
Derdimiz deva bulsun,  
İlmimiz revaca girsin ?  
Olsaydı eğer bir başyükseğimiz,  
İyilik sahibi bir şiir istiyenimiz  
Bizim de külçemiz sikkeyle basılır, (1)  
Bu denli revaçsız ve şüpheli kalmazdı,  
—Ne kadar safi ve temiz olsalar da,  
Altın ve gümüş sikkeyle değer kazanırlar—

Biz öksüzlere acır,  
Namertlerin elinden kurtarırdı bizi.

Her kim ki himmet elini kılıça götürdüyse,  
Kendisi için devleti zaptetti erkekçe.

(1) Külçe, altın ve gümüş aşağıdaki bölümden de anlaşılacağı gibi mecazi olarak edebiyat anlamında kullanılmış.

Lewra ku cîhan wekî erûse  
 Wê hukmê dî destê şûrê rûse  
     Lê eqd û sîdaq û mehr û kabîn:  
     Lutf û kerem û eta û bexşin (1)  
 Pirsi ji dinê min ev bi hîkmet:  
 «Mehra te çî?», gote min ku: «Hîmmet»  
     Hasil Ku: Dinê, bi şûr û îhsan  
     Tesxîr-i di bit jiboyê însan  
 Ez mame dî hîkmeta Xwedê'da  
 Kurmanc-i dî dewleta dinêda  
     Aya bi çî wechî mane mehrûm?  
     Bîlcimle jibo çî bûne mehkûm?  
 Wan girtî bi şûr-i şehrê şuhret  
 Tesxîr-i kîrin bîladê hîmmet  
     Her mîrekî wan bi bezlê Hatem  
     Her mîrekî wan bi rezmê Rîstem  
 Bî'fkir ji Erab heta ve Gurcan  
 Kurmancîye bûye şîbhê bircan  
     Ev Rûm û Ecem bi wan hesarın  
     Kurmanc-i hemî li çar kenarın  
 Herdu terefan qebîlê Kurmanc  
 Bo tîrê qeza kırîne amanc  
     Goya ku li serheden kîlidin  
     Her taîfe seddekin sedidin

.....  
 .....  
 .....

---

(1) Mana vê rêzê û a berî wê eve: Dinê wekî bûke, hukmê wê ji dî destê şûrê tûjdaye, ki xwediyyê wî şurîbe ew ji xwera bûkê di be; lê qencî û camêrî u bexşin, ji qelen û hegê marbirin û Kabîn'a bûkêne.. Nexu dî vê berê mîrov bi zor bûkê bîne û bi ke malê xwe, paşê qencîya xwe bi ke.

Çünkü dünya bir gelin gibidir,  
Keskin kılıçın elindedir onun hükmü de.  
Fakat başlığı, ceyizleri, düğün hediyeleri;  
İyilik, cömertlik, lütuf ve bağıstır.  
Ben hikmetle dünyaya sordum ki:  
«Başlığın ne senin?» Bana dedi ki: «Himmet»  
Kısacası: Dünya kılıçla ve iyilikle  
İnsana ram olur, boyun eger.  
Ben Allahın hikmetinde şaşakaldım:  
Kürtler dünya devletinde,  
Acep ne sebeple kalmışlar boynubükük,  
Hepsi birden niçin olmuş mahkûm?  
Onlar kılıçla söhret şehrini fethetmişler,  
Himmet ülkesine boyun eğdirmişler.  
Onların her bir beyi Hâtem cömertliğinde,  
Ve Rüstem cengâverliğindedir her bir erkeği.  
Bak, Arabistan'dan Gürcistan'a kadar  
Kürtlükür olmuş kaleler gibi.  
Bu Rumlarla Acemler onlarla hisar olmuş,  
Kürtlerin hepsi dört kenarda yer tutmuş.  
Her iki taraf, Kürt kabilelerini,  
İmha oklarına hedef yapmışlar.  
Sanki Kürtler sınır başlarında kilitmişler,  
Her kabile sağlam bir set gibidir.

.....  
.....  
.....  
.....

Ciwamêrî-yû hîmmet û sexawet  
 Mîrînî-yû xîret û celadet,  
     Ew xetme jibo qebîlê Ekrad  
     Wan dane bî şûr û hîmmetê dad  
 Hindî ji şecaetê xeyûrin  
     Ew çende ji mînnetê nefûrin  
     Ev xîret û ev ulûwwê hîmmet  
     Bû manîê hemlê barê mînnet  
 Lew pêkve hemîşe bê tifaqin  
